

## Sefera Hindistanê - 2

Saet 04:30ê beyanîyê ye. Xwe mîna kesekî li Antartîkayê li benda trêne be, hîs dikim. Hêdî hêdî qehweyê vedixim û ji nanfiroşa delal dipirsim: „Xwe dispêrim ezmûna we! Gelo di rewşên wiha awarte da seferên trênan hene?“ Tengegavîya min dibîne û dibêje: „Meraq mekin! Bahoz derbas bû. Trêna dê were.“

Pênc kêma çarêk e. Careke din li tabelayê dinihêrim, îcar trêna Frankfurtê xuya dibe. Nimroya trêne, saeta wê hemû rast in. Gerçî ew dê deh deqe dereng rabe. Lê piştê belaya bahoz Thomasî, evqas jî normal e. Ji kêfê qehweyê din jî ji xanimê dikirim û hema berê xwe didim perona trêne.

Li jorê hewa vekirî û hênîk e. Hem ji şabûna û hem jî ji qehra Thomasî du-sê cixare li pey hev dikişînim. Bi qehweyê ra xweş diçe mîrat li vê beyanîya xewar.



*Min biqasê wan saduyan merivên bêhnfireh nedîtine li ser rûyê vê cîhanê. Belkî jî ez rastê bêhtengîya wan nehatime. Bi rojan birçî bin, ne xema wan e. Keq Sadu, rojên min ên greva bircîbûnê yên zîndana Amedê anîn bira min. Ez li zîndanê birçî bûm, ew li cîhanê.*

*Li ber dîwarê pireyê ez li kêlekê rûniştim. Me bi hev ra qelûnekê kişand, paşê em rabûn, me vê fotoyê kişand.*

*Li bajarê Pûşkarê*

Deh deqe şûnda di trêne da me. Ev trênen ICE mîna gulle dipekin armancê. Dema ji bajêr dertên leza wan digihîje 300-400 kîlomêtroyê. Hewl didim ji pencereyê binihêrim. Gelo bahozê çend dar rakirine, çend ban firandine? Nafîle, naxuyên. Ji leza trêne hemû dar, reşayîyên xaniyan bûne xêzîkek.

Hîs dikim ku pir westî me. Meseleya „aqilê sivik barê giran!“ Ji westînê jî wêdatir e. Li halê xwe dinihêrim. Jîyanê mîna kirasekî lîmelîme ez dirandime. Pala xwe didim palkursiyê. Lez, demê tîş dike. Ber bi pêş û paşerojê va diherike.

Mîna qirşekî dixwezim xwe pê bigirim. Çiqas xwe pê digirim, ewqas noqê kunên reş dibim. Tuneleke ripîreş. Dawî ronahî ye, yan tuneleke din e? Nizanim. Ka geremola lezê dê çi bi xwe ra bîne?

Xwelîya bîranînên min ên mirî ya di goristana binhişistanê da veşartî, xwe li rûyê min dide. Dertê serhişê min. Hinek ji wan pir xerîb dixuyên bi min. Min ew jîyane, nejîyane? Yên min in, an na? Nizanim.

Ne li bendê me. Neku bi zanîn ew tînim bîra xwe. Ew temamen tesadûf ji geramolê dertên. Lez, wan mîna astroîdên serserî ber bi min va tîne. Yan jî min ber bi wan va. Em hemû di gerîneka lez û demê da pêkva diçeliqin. Nikarim xwe jê biparêzim. Tenê çavên xwe digirim, ji bo ku kor nebin.

Gelo çima ewqas hez ji seferên welatan, ji xerîbîyê dikim? Ji ber reva min a ji xwe ye. Jîyan û serûwen e. Bêwelat û bênasnameyîya min e? Çi ne? Nizanim.

Di nava ewqas ger û seferê da çima carekî jî li war û welatê xwe venagerim?

Nikarim. Bikarim jî naçimê! Ewqas ku qirêj kirine wî war û welatî. Hindistan ji çopê genî bûye. Daneser Kurdistan ji qirêjîya ruh û ramanê. Ne kes pûte bi gotinên min dide ji bo paqijkirinê, ne jî min hêz heye.

Kabikên xwe digirim ji bo çend deqe razêm. Dema wan vedikim gihîştme Frankfurtê. Du saet zêde ne jî, ji bo gihîştina balafirê. Ji trêne peya dibim, li metroyê siwar dibim. Deh deqe şûnda li balafirxaneyê me.



*Saduyên li bajarê Varanasiyê. Li ser pêlîkên rêya ku diçe ber Ganja "pîroz". Bi saetan, bi rojan wisa li ser wan pêlîkan rûdinên, di nava medîtasyonê da. Çima? Bi hizira min, ji bo ku biqarin li hember birçitî û xîzanîyê li ber xwe bidin, hîne medîtasyonê bûne. Yan jî ji bo dest û hevtyên xwe ji vê cîhanê bibirin, xwe bi bawerîyên olî tevizandîne. Dilnîz û bi xurûr in. Ti car destên xwe venakî û parsê nakî. Divê meriv alîkarîyê bide wan. Hindî dema di ber wan ra derbas dibim, ji pere, xwarin û vexwarinê alîkarîyê didin wan. Yekî ji wan rûyên doqtoran nedîtîye. Ne mirin di xema wan da ye, ne jî jîyan. Seyir in ev sadunine...*

## Teyrehut

Balafirxaneyê Frankfurtê mezintirîn balafirxaneyê Almanayê ye. Meriv ji serîyekî here serê din saetek derbas dibe. Ji du avahîyên mezin pêk tê: A. û B. A. ji bo firînen parzemînan û alîyên din ên okyanûsan e. B. ji bo welatên Ewropayê û yên nêzîk e. Xetên trênan ji ber balafirxaneyê derbas dibin. Bê ku dem wînda bikim, dertêm jorê û diçim avahîya A.yê.

Ez ê bi Lufthansayê bifirim. Ji bo bardkartê diçim ber şaltêra Lufthansayê. Belê, memûrên wê jî hene, lê mîna berê meriv nakeve dorê. Niha hemû bûne automat. Pasaporta xwe datîni ser camê automatê, ew pasê dixwîne û hema bordkartê dide. Min bordkartê ji automat efendîyî wergirt. Bawola xwe da memûreyê. Wê jî, ew ji maşîneya skenayê derbas kir û şand balafira ku wê bifire Delhîyê. Yanê bawola min a xerîban li berîya min siwarê balafirê bû.

Min jî berê xwe da Gateya 34 an, balafira li wir li benda min. Saet û nîvekê min maye. Meriv hêdî û bi ger here di çil deqeyan da xwe digihîne G.34an. Min jî wisa kir. Bi nihêrîna li camekanên maxazeyên lukus ên her du qatên balafirxaneyê ra, min berê xwe da G.34 an. Li nivê rê min qehweyekî jî vexwar û berdewam kir. Otoyên servekirî, rêwîyên seqet û nexweş hildidan û di navbera Gateyan da diçûn û dihatin. Herhal çend sal şûnda ez ê jî mecbûrê van otoyên bibim.

Dema hatim ber gateyê niv saet mabû. Bi gotina polêsê gumrûkê ra min cilên xwe ji xwe kirin. Tenê pantolon û kiras li ser min man. Ez jî mîna bawola xwe ji maşîneya skaneyê derbas bûm. Cilên jixwekirî li xwe kirin. Bi sedan rêwîyên ji enwayên milletan jî mîna min mijûl bûn, bi cil lixwekirin û jixwekirinê. Ez çiqas ji gumrûkan derbas bim, çend deqeyên berîya firîne, mîna ku ez êdî ne li ser erdê wî welatê bim.

Ji pencereya gateyê li jêrê dinihêrim. Çi bibînim? Balafireke azamet a li ser Airbus 380 nivîsandî li benda min e. Bi çavên xwe ne bawer im. Ji memureke gumrukê dipirsim, „belê“ dibêje, „Hun ê bi vê teyrehutê bifirin Delhîyê.



*Mezintirîn balafira  
cîhanê A380 mîna  
teyrehutekî li ser deryaya  
ewran difire. Seyîr û  
sefera li ser ewiran,  
nemaze di demên rojhilat  
û rojavayê da xewneke  
zehmet vegotbar e. Bi  
saya balafiran dunya  
bûye gundekî biçûk.  
Niha berê xwe dane  
planetên di fezayê da.  
De îcar milletên xwedî  
aqil, zanistî û teqnikê û  
yên ku di rêşetariya  
îslamê da tevîzîne bidîn  
ber hev!*

Yekemîn car e siwarê A380 balafira duqat a herî mezin a cîhanê dibim. Ew heta 900 rêwîyan hildigire. Vê balafirê 2013 an de derxistine seferê. Pêşî di rêya Sîngapurê da ceribandine. Piştê ku jê ewle bûne, niha Lufthansa û şîrketên mezin ên cîhanê jî van balafiran kirîne. Heke Kurdeke/î heta niha ber bi Singapurê û Malezîyayê da nefirîbe, herhal yekemîn Kurd im, ku ez dê niha siwarê vê balafirê bibim. Her yekemîn heyecanê dide.

Lêdana dilê min e. Tabî zêde heyecan ji tendurustîya min ra nebaş e! Ji bo pîrozkirinê hîn dema min heye ku badeyekê vebixwim. Çimkî hîn bi sedan kes li bendê ne, ku siwarê vê teyrehutê bibin. Bi kêmbûna rêwîyên li ber derîyê G34an ez jî karta firînê didim memûreyê. Ji pireya navberê derbasê zikê vê hûtê dibim.

Airbus balafireke Ewropayî ye. A380 ji alîyê Almanya, Frensa, Îngilistanê va ji 2005an vir da tê hilberîn. Mezin, mezintir û mezintirîn sê cureyên wê hene: A380-700, A380-800. A380-900. Bilindayîya wan 24.10 mêtro ye. Dirêjayîya A380-800ê 72,30 mêtro, firehî, 846 m<sup>2</sup>, kapasîteya rêwîyan 868 kes e. Dirêjayîya A380-900ê 79,40 m., firehî, 846 m<sup>2</sup>, kapasîteya rêwîyan 960 kes e.

*Hezret çêlek, di  
nava çop û  
genera bajarê  
Varanasiyê da  
şîretan li min  
dikîr, ku min  
bikê softiyekî  
hindî.  
Çêlek-mêlek,  
lêbelê hezar car  
ji pêxemberên  
olên din çêtir e.  
Qenebe bi  
xurafeyan xelkê  
naxeriqîne. Bi  
şîrê xwe bi  
hezaran salan e  
mirovahîyê  
xwedî dikê,  
mîna dîya wan.*



Dema ketim hundur mîna ku bajarokekî bi tax û kolanan ji hev veqetiyayî bibînim. Qata binî ya ku ez tê da me, ji bo çîna "feqîr" e. Ji du qorîdoran pêk tê. Li her alîyekî pencereyan li kêlek hev sê palkursî, li qorîdora navîn jî çar palkursî hene. Qata jêrê bi dîwar û derîyan ji hev veqetandine, kirine çar beş. Cîyê min li beşa pêşîn, li qorîdora navîn e. Li alîyê min ê çepê yekî Malezyayî. Li alîyê rastê jin û mêrekî Hîndî rûdiniştin. Em ê heft saet û nîv bi hev ra bifirin. Min silavek da wan û li cîyê xwe rûniştim. Di beşa ku ez tê da me 250 rêwî hebûn. Piraniya wan Hîndî, Çînî û ji welatên Asyaya dûr bûn. Ew di ser Delhîyê ra diçûn welatên xwe. Şeş li alîyekî, şeşên din li alîyekî, tenê di beşa me da 12 hostesên delal û kubar xizmetê dikirin.

Qata jorê ya A380, bussines klas û first klas e. Yanê cîyên çîna dewlemend û super dewlemendan. Cîyên wan fireh û rihettir e. Lê ew bi xwe ne fireh û rihet in. Palkursîyên nermik mîna şûjin di wan ra diçin. Li cîyên xwe star nabin. Li her alîyekî du palkursî hene. Mîna otêlên pênc stêrk odayên „taybet“ jî hene ji bo mirovên xwedîyên gellek taybetîyên ecêb û nepenî.

Piştê amadeyîyên dawîyê balafir ji firînê ra amade bû. Em hemû di heyecanê da bûn. Gelo ev teyrehuta ku bi qasê giravek e, wê çawa rabe? Ji mezinîya wê merîv ne lez û ne jî firîna wê hîs dike. Pozê xwe bilind dike û difire.



*Şeva ayîna  
Hindîyan li ser  
çemê Ganjê, li  
bajarê  
Varanasîyê.  
Şaş fêm mekîn!  
Neqû min guhî da  
şîretên hezret  
çêlek xanimê,  
bûm hindî. Meriv  
heta ber Ganjê  
here, bi tevê bi  
sed hezaran  
mirovan ra  
medîtasyonê  
meke, mîna  
xîyarekî dimîne li  
meydanê.  
Şerm e tabî!*

Mîna ku stadyumeke duqat bi her du turubînên xwe va rabe hewayê û bifire. A380 jî hesteke wisa çêdike bi meriv ra, dema ku difire. Balafir piştê bilindbûna ser deh hezar mêtroyî ket xeta xwe ya firînî. Heta Hindistanê, çiqas welat hene em dê di ser ra bifirin. Pêşî welatên rojhilatê Ewropayê, paşê Rûsya û welatên Asyaya navîn û di ser Hîmalayan ra Delhîya Nû. Ji ber ku şev e, mixabin ez dê nikaribim Hîmalayan bibînim.

Cîyê me yê ekonomîk klas her çiqas teng be jî, di her palkursîyê da tv, înternet hemû teknîkê, xistine xizmeta rêwîyan. Xwarinên wan jî ne xirab in. Piştê vexwarina badeyeke şerab û bi bandora westînê ra hema raketim. Min dema çavên xwe vekirin du saet derbas bibûn. Balkêş bû, xeweke bê xewnên erjeng bû ew şev.

Ji stresa li Berlînê, min berîya firînê pir cixare kişandibû, ji wê bû nizamim, serî li min dizivirî, min xwe nerihet hîs dikir. Rabûm ber bi tuwaletê da çûm. Paşê jî xwestim derkevim qata jorê cîyên lûkus ên qereseyan bibînim. Bi pêlêkan hilkişîyam jor. Li jora pêlikan hostesekê bi keneke nîvwate got: „Mixabin destûr nîne hun li qata jorê bigerin!“ Bersiva wê li zora min çû û pîspîs hatim li cîyê xwe rûniştim.